Kurdish (Kurmanji)

Vîrosa Korona (COVID-19)

# COVID-19 Têstkirin

## Kî divêt xwe têst bike (muayene bike)?

Her kesê pê re şanên wek yên sermagirtinê yan zekemê hebin, heta ger hindik bin, divêt xwe bi zûtirîn dem bo COVID-19 têst bike. Hinek ji şanên COVID-19:

- himma, wek lerizandinê (recfê), xuhdana êvarê
- şanên bi nefeskişandinê re eleqedar wek kuxînê, êşa/xura gewriyê, lîka ji poz, nefestengiyê, wendakirina hestên bêhnkirinê û tamkirinê
- şanên din, wek êşa tamaran û mofirkan, navçûn, gêjbûn, vereşandin û nebûna hewasa li xwarinê.

## Mirov dema têstkirinê çi çaverê bike?

- Têstkirin belaş e, hêsan û zû ye.
- Ger tu bo klînîkeke têstkirinê hatiye hewalekirin, kaxiza hewalekirinê (referral) bi xwe re bibe. Bo pirraniya klînîkan hewceya wê nake.
- Karmendên klînîkên têstkirinê û kêşeyên nefesê (respiratory) maskan, berdêlkan, lepikan û rûparêzan bi kar tînin.
- Karmend dê derheqê şanên bi te re hene bipirsin.
- Beşikên ji şillîya nav pozê te û gewriya te dê bihên girtin.

## Li dû têstkirina min çi dibe?

- Divêt li mala xwe bimînî (xwe veqetînî) ta ku encamên têsta te xuya dibin û tu xwe baş hest dikî.
- Navêt ji mala xwe biçî der, ji bilî çûna bo serpereştiya tenduristî yan sedemeke ‘pirr acil’ (emergency). Navêt mêvanên te hebin.
- Ger şanên bi te re ceddî bibin (wek tengbûna nefesê), telefone sê caran sifir (000) bike. Karmendên hawarê (ambulance staff) agahdar bike te têsta COVID-19 kiriye.
- Ger kesên din bi te re li mala te bin, divêt tu xwe veqetînî û biçî odeyeke din. Maskeke pijîşkî hilgire ger hûn di odeyekê de bin û bi metro û nîvekî (1,5) ji hev dûr bin.
- Li pakiya baş miqayit be. Destên xwe pirrcar bişo. Enîşka xwe bide ber kuxîna xwe û bonijandinê yan klînêksê (tissue) bide ber.

## Dikarim ji ku bêtir agahdarî derheqê xwe-veqetandinê de bi dest xim?

https://www.health.nsw.gov.au/Infectious/covid-19/Pages/resources.aspx

- Ger nêzikbûneke zêde di navbera te û kesekî COVID-19 pê re heye de cîh girtibe, divêt tu 14 rojan li mala xwe bimînî, ji dema te ew cara dawîn dîtiye. (Nêzikbûna zêde, yanê wek jiyana di malekê de, yan tevmayîna rû bi rû bêtir ji 15 xulekan, ‘deqîqe,’ yan tevmayîna di şûneke teng de bi kesekî ku COVID-19 pê re heye bo 2 sa’etan, bi 48 sa’etan pêş nexweşbûna wî/wê).
- Xwe-veqetandina li malê bo hemî haletên nêzikbûna zêde ye, heta ger xwe nuha baş hest bikî û/yan encamên têstkirina te nerênî bin (negative).

## Ez ê çawa encamên xwe bi dest xim?

- Pirraniya caran mirov di navbera 24 û 48 sa’etan de encamên xwe bi dest dixe, lê tika ye ta 72 sa’etan navberiyê bidê.
- Ger te têsta xwe li şûneke zûtehqîbkirinê *(Emergency Department)* kiribe yan di klînîka COVID-19 ya nexweşxaneyeke giştî de, dikarî encama nerênî ya COVID-19 bi SMS bi dest xî, ger tu xwe ji bo Xizmeta bi navê *Pathology COVID-19 SMS Results Service* qeyd bikî. Ger xwe qeyd nekî, karmendekî Tenduristiya Giştî ya beşê herêma te dê telefone te bike.
- Ger têsta te ji aliyê pijîşkê te ve *(GP)* hatibe rakirin, yan ji şûnên din, pijîşkê te dê encaman bide te.

## Ger encamên têstkirina min erênî bin *(positive)* çi dibe?

- Tenduristiya NSW dê li te binihêre. Pere ji te nahên xwaztin, heta ger te *Medicare* nebe.

NSW GOVERNMENT

Vîrosa Korona (COVID-19)

# COVID-19 Têstkirin

## Dikarim xwe li ku têst bikim?

- Serîlêdana klînîkeke COVID-19 bike:
  https://www.health.nsw.gov.au/Infectious/covid-19/Pages/clinics.aspx
  YAN
- Telefone pijîşkê (doktorê) xwe bike

**Şûnên klînîkên Tenduristiya NSW bo têstên COVID-19**

| Dever (Suburb) | Şûn | Sa'etên karkirinê | Telefon | Hewalekirin divêt? |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |
| | | | | |

© NSW Health June 2020. SHPN (HP NSW) 200310